

TIRMEH 2022

KURDÎ

The Hall

**DI FESTÎVALA
KIRKISRAKIYAN DE
KONSERA ŞIVAN PERWER**
Erol Başak

**CIWAN HACO
LONDON RAKIR GOVENDÊ**
Erol Başak

**KITÊBA MUQEDES
ERD Û ASÎMAN**
Necat Zivingî

**GIRINGIYA
BERHEMÊN
FOLKLORÎ**
Zeynelabidin Zinar

www.thehallkurdi.com

TheHallkurdî
E-kovara çandî ya mehane
Hejmar 7, Tirmeh 2022

Damezrîner

Osman Kômürcü
Erol Başak

Editor

Erol Başak

Rûpelsazî

Ridwan Xelîl
ridwanxelil@gmail.com

Bergsazî

GrafiKURD

Navnîşan
London UK

The Hall Kurdî

Endama Koma
Kovargerên Kurd e

www.thehallkurdî.com

thehallkurdî@gmail.com

+44 7915 413436

@KurdîHall

TheHallKurdî

The Hall Kurdî



*E-kovara The Hall Kurdî hesas e ku kovar di wextê xwe de bê weşandin.
Ji fikrên di gotaran de hatine parvekirin û ji rastnivîsa wan nivîskar bixwe bersivek
û ne mecbûr in ku ew mîna yê weşanger û editor bin. Hemû gotar, nivîs, pêşgotin, reklam,
materyal û naverokên din bi niyeteke safî hatine amadekirin.*

NAVEROK



Nameya Edîtor

Silavên germ ji Londonê.

Ev bajarê Londonê ji her alî ve tişî sûrprîz e. Îmkan û derfet gelek in. Cihê azadiyê ye, nexasim ji bo me Kurdan.

Erol Başak ▶ 4



Şivan Perwer
Li Londonê Konser Da

Erol Başak ▶ 5



Giringiya Berhemên
Folklorî

Zeynelabidin Zinar ▶ 23



Ciwan Haco London
Rakir Govendê

The Hall Kurdî ▶ 9



Li Bakur û Tirkîyê
Weşangerî Ber Bi
Têkçûnê Ve Diçe

Mevlüt Oğuz ▶ 27



Kitêba Muqedes
Erd û Asîman

Necat Zivingî ▶ 12




DAVID FINCHER:
Yek Ji Sînemagerê
Giring yê Salên 90î
û Sedsala Nû

Rûmet Med ▶ 31




Dengbêjî Li Radyoya
Ûrmîyeyê û Dengbêj
Îran Xanima Mucered

Sewîm Qoserî ▶ 15



Dîroka Peykeran

Hogir Ar ▶ 34



Nîgarxêzê Ciwan
Asem Norik Musoyan

Hevpeyvîn: Erol Başak ▶ 19



Cizdanên Herî Baş
Ûn Ji Bo Veşartina
Pereyên Kripto

Digikurd ▶ 39

NAMEYA EDÎTOR

EROL BAŞAK

Silavên germ ji Londonê.

Ev bajarê Londonê ji her alî ve tijî sûrprîz e. Îmkan û derfet gelek in. Cihê azadiyê ye, nexasim ji bo me Kurdan.

Loma dikarim bêjim ku meha Hezîranê gelek xweş derbas bû ji bo min. Lewra du stranbêj û hûnermendên gewre û pêşengên Kurdan Şivan Perwer û Ciwan Haco li vir bûn.

Nizanim London nebûya an ez nehatima vî bajarî gelo min ê bikariya li Tirkîye û Bakurê Kurdistanê biçûma konserên wan?

Ewrên ewqas reş li ser welatê me hene, meriv nikare xeyala hatina wan a Bakur jî bike.

Min çi dît?

Şivan Perwer bi boneya festîvala Kirkîsrakiyan hatibû Londonê. Di çarçoveya festîvalê de qedere saetekê li ser dikê ma û konsereke piçûk da. Lê belê her çendî ew ne festîvaleke zêde cidî be û girseya li wir ne mîna li Kurdistanê qerebax be jî Şivan mîna ku li Kurdistanê konserekê bide bi hesteke kurdewar derket ser dikê. Dîsa cilê Kurdî, şal û şapik li bejnê bûn. Ew dengê wî yê bilind û tesîrdar ne guheriye. Gava li kursiya xwe rûnişt û tembûra xwe lêxist ew dîmena dîrokî ku li ber pêşmergeyan konser dabû hate ber çavên min. Bi rastî demên pir xweş, hestiyar û watedar bûn. Ez ji 5-6 saliya xwe vir ve wî dengî nas dikim. Tê bîra min xalê min sala 92an bandeke Şivan bi dizîka anîbû gundê me û cara pêşî min li stranên wî guhdarî kiribûn. Dîtin û guhdariya Şivan bi azadî gelek xweş bû.

Ji bo min rûdana din a serbilindiyê jî dîtina Ciwan Haco bû. Heftyekê piştî Şivan, Ciwan hate Îngîlistanê. Ji bo wî du konser hatibûn sazîkirin. Ya ewil li bajarê Manchesterê bû. Li Manchesterê pirranî Kurdên me yên Başûrî hene. Ciwan Haco di eywaneke piçûk de ji bo wan strî. Rojekê piştî wê jî hate Londonê. Birastî kêmasiyên konserê gelek bûn lê dîtin û guhdariya Ciwan Haco her tişt da jibîrkirin. Ciwan bi stranên çoş kesên li eywanê rakirin govendê. Bi henek û gotinên xweş demên pir

bi kêf û ken li me borandin. Ciwan zilamekî ji dil û şêrîn e.

Di hejmara vê mehê de nûçe û hevpeyvînên kurt yên van her du hûnermedên gewre cî digrin.

The hall Kurdî vê mehê gelek tijî û rengîn e.

Helbestvan û Nivîskar Necat Zivingî vê carê li ser "Kitêba Muqedes" nivîsî. Bi gotina Zivingî Kitêba Muqedes ji Tewrat, Zebûr û Incilê pêk tê û ew bi mêzîna eql û zanistê tê de derketiye rewîtiyê.

Dîsa di vê hejmarê de em ê denbêjeke Rojhilatî bi we bidin nasîn. Sewîm Qoserî nivîsî: Dengbêjî li Radyoya Ûrmîyê û Dengbêj Îran Xanima Mucered.

Kovara Hezîranê de bi hûnermendekî ciwan û serkeftî re hevpeyvîneke me jî heye. Asem Norik Musoyan Kurdekî Êzdî ye li Moskowê. Bi nîgarxêziya xwe balê dikîşîne.

Mamoste Zeynelabîdîn Zinar ji bo The Hall Kurdiyê girîngiya berhemên folklorî nivîsî. Di encama xebata wî ya 12 salî de şîret û pêşniyazên wî yên heja di vê gotarê de hene.

Rewşa weşangeriya kurdî li Tirkîyê û Bakurê Kurdistanê babetekê din a vê mehê ye. Rojnameger Mevlût Oguz ji bo kovara me rewş analîz kir.

Hûnermend Hogir Ar li ser Dîroka Peykeran gotarek hazir kir. Ji Misr û Yûnanê bigrin heya peykerên li Kurdistanê derket rewîtiyekê.

Sînema û teknoloji jî babetên din yên vê hejmarê ne. Rûmet Med derhênerê xwedî Xelata Oscarê David Fincher nivîsî.

Digikurd ji bo meraqdarên krîptoyê analîzek kir û 5 Cizdanên Herî Baş Ên Ji Bo Weşartina Peryên Krîpto amadekirin.

Azadî pir xweş û bitehm e.

Bi hêvîya rojên azad li Kurdistanê...

Dev ji Kurdiyê bernedin.

DI FESTÎVALA KIRKISRAKIYAN DE KONSERA ŞIVAN PERWER EROL BAŞAK

Komeleya Kirkisrakiyan li Londonê festîvalek li dar xist. Di çarçoveya festîvalê de gelek hunermedên Kurd û Tirk konser dan. Yek ji wan jî Stranbêjê kurd ê gewre Şivan Perwer bû.

Kirkisrak gundeki Kurdên Elewî ye li Kayseriyê ye. Di sala 2005an de wan li Londonê tevî gundên dorhêlê komeleya xwe ava kirin. Ev çend sal in ji bo parastina çanda xwe û ji bo hevnasîna milletên xwe festîvalên bi vî rengî li dar dixin.

Îsal dora 10 hezar kesî beşdarî festîvalê bûn. Piştî pandemiyê ji bo bêhnvedan û hevnasînê festîval îmkaneke mezin bû. Bêguman piraniya wan bes ji bo dîtin û guhdariya Şivan Perwer hatibûn.



Serokê Navenda Piştewaniyê ya Kirkisrakiyan Ali Demirci ji bo kovara me agahiyên festîvalê parve kirin.

Ev du sal in ji ber pandemiyê ti çalakiyên me yê civakî çenedibûn. Me xwest bi festîvaleke mezin hemû gundiyan xwe û milletên gundên dorhêlê û hemû pêkhateyan navenda piştewaniyê li hev bicivînin û festîvaleke gelek xweş jî çêbû. Gelek hûnermend hatin. Bi saya hûnermend Zeynep Baksi, Şivan Perwer, Murat Çelik, Kara Hasan û Ozkan Orman û tîma Sazbendê ku di komeleya me de perwerde bibûn û tîma folklorê, festîvaleke rengîn û serkeftî pêk hat.

Şivan Perwer piştî salan cara yekem di Festîvala Kirkisrakiyan de stîrî

Bi salane Şivan Perwer nas dikim. Min dizaniya ku gava ez gazî bikim dê were. Hinekan bi min bawer nekir û gotin ew nayê. Lê ew hiqûqa navbera min û Şivanî de nedizaniyê. Mala wî ava be Şivan hat û bernamayeke gelek xweş çêkir.

Eleqeya wan ji Perwer re hêjayî dîtîne bû. Piştî konserê kesên ku dixwastin pê re wêne bigrin ketin dorê. Tevî ku rezeke gelek dirêj çêbû Şivan Perwer dile tukesî nehîşt û bi wan re yekbiyek wêne kişand û sohbet kir.

Di nava ewqas qerebalixê de û tevî ku wextê wî gelek hindik mabû diviya biçe, dîsa jî daxwaza me ji bo hevpeyvîneke kurt qebûl kir. Şivan Perwer sedema hatina xwe ya vê festîvalê ji The Hall Kurdîyê re got.

Elewî rengîniya Kurdistanê ye, em nehêlin elewiyên me bibin qurbana kesên din

Belê ez naçim her bernamaye. Hinek profesyonelî dixwazim. Lê ev xelkê me yê elewî ne. Komeleya xwe çêkiriye. Elewî rengîniya Kurdistanê ye, gelek gelek kevn e û ji nav



me derketiye. Ehlê Heq bûye Ehlê Beyt. Wisa çêbûye. Yên di teîzmê(Xwedaperestiyê) de bêtir gav avêtine Kurd in. Elewîfî renegekî Kurdî ye. Ji ber wê yekê jî em nehêlin Elewiyên me bibin qurbana kesên din. Elewiyên Tirkên jî hene, yên Ereban jî hene yên Farisan jî hene lê yên Kurdan jî hene. Lêbelê Elewiyên Kurdan navxwe de bicivîn baş e û bêtir hinekî Kurdistanî bin baş e. Ev zor girîng e. Mebesta min a hatina vê festîvalê jî bêtir ev bû û li ser dikê min di axaftina xwe de jî ev yek got. Bila miletê Kurd xwe di bin kesekî de nebînin tu carî. Ez jî heme li vê dinyayê, mafê min e, jiyana li ser axa welatê min û azadiya min.

Miletekî ku nexwedî axa xwe be weke dara ku koka wê birî ye. Ku kok hate birin ew dar êdî şîn nabe. Divê ji koka xwe neqete, ev girîng e.

Kurd miletkî mezin e. Eger Kurd bixwe ji xwe re qawetekê, hêzekê çênekin dê belabûyî bimînin. Di vê belavbûyî de jî



nikare ji mafên xwe îstîfade bike. Dijminên Kurdan jî her dixwazin bila Kurd belabûyî bin. Beriya her tiştî ji aliyê zaravî belav bûne, bi welatî belav bûne, bi bawerî belavbûne. Lê Kurd di zarava û baweriyê de pir renginin. Kurdistan jî bêyî îradeya miletê Kurd par û parçe bûye. Ev parçebûn zehmeteke pir mezin daye ser doza miletê Kurd. Ji ber wê hawê Kurd li her hêlên jiyane çî ji destê wan bê gerek li zimanê xwe, kultura xwe, edeba xwe xwedî derkevin, gerek rêçeke siyasî ya yekbûnê jî ji xwe re bibîne. Gerek van meseleyên olî û mezhebî kêmbikin, bêjin bo miletekî girîngtirîn tişt ax û azadî ye. Miletekî ku nexwedî axa xwe be weke dara ku koka wê birî ye. Ku kok hate birin ew dar êdî şîn nabe. Divê ji koka xwe neqete, ev zor zor girîng e.

Ji ber wê qedr û qîmeta welat zanebûn e. Divê gotina “Kurdistan welatê me ye” ji me ere gotineke pîroz be. Ji zimanê xwe pir pir hez bikin. Pêşeroja zarokên xwe bifikirin. Ev mesele muhîm e. Siyaset û gotina bijî mijî kesî têr nake. Ji me re hinekî akademik xebat lazim in, fêrbûn lazim e. Enstîtûsyon lazim e, dizanî! Îngilîstan welatekî mezin e û pir alîkariyê jî dike. Ji ber vê jî ji Îngilîstanê îstîfade bikin. Heke hûn projeyan amade bikin, plan program deynin pir rihet dikarin mafê perwerdehiyê jî bistînin. Îngilîstan bixwe jî alîkariyê dike. Ji bo sosyal bûn ev komele filan lazim in lê çara her tiştî nîn in. Bila xebatên akademik, enstîtûsyon hebe ew çara her tiştî ye.

Di ziman de fêrgînî ye, di dîrokê de fêrgînî ye, di felsefeyê de fêrgînî ye, di civakê de fêrgînî ye, di her warî de fêrgînî ye. Enstîtûsyon ango ew bingehên akademî gerek çêbibin. Beriya her tiştî ez vê wisa girîng dibinim. Ev 40 sal in ez dibêjim. Hêjî fêrbûn çênebûye. Min dest bi stranê kiriye min gotiye bixwînin. Xwendin mejiyê mirova perwerde dike.



Hûnermendê gewre pesnê kovara me jî da.

Xebata we pir girîng e. Kovar be rojname be bi kurdî derketina wan sûper e. Siheta we xweş. Qet şûn de nehêlin.

Bi saya vê festîvalê bi hezaran kes cara yekem ghiştin îmkana dîtina û guhdariya Şivan Perwer.

Çend ji wan kesên bi siûd hêstên xwe ji bo kovara me parve kirin.

**Ozgur Atas
Xelkê Semsûrê**

Hesteke pir xweş e ku meriv guh bide wî. Ez li Stenbolê ji dayik bûm û bi stranên Şivan mezin bûm. Lê ji ber ku wî nikarîbû bihata Stenbolê û ne jî bihata Bakurê Kurdistanê, me heta niha zindî guhdariya wî nekiribû. Ev cara yekem bû ku ez guhdariya wî dikim. Ew hîn



jî hûnermendekî gewre ye. Kêfxweşiyêke wisa baş e ku meriv li Londonê guh bide wî. Ev jî yek ji avantajên mayîna li Ewropayê ye.

Daleel Hagy-Xelkê Qamişlo

Şivan Perwer ji bo gelê bajarê min sembolek e. Dîtina wî di şexsê xelkê Qamişlo de tiştêkî durrî destê xelkê ye, lewra dîtina wî di şexsê wî de hestek nû ya xweş bû. Bi dehan sal e em li stranên wî guhdarî dikin. Bihîstina dengê wî bi zindî ji bo min hema hema yekem tecrûbe ye ku dengêkî sanal vegere dengêkî rasteqîn. Bi rastî ez spasiya wan kesên organîzatorê vê çalakîyê dikim.

Kadir Koçer-Xelkê Wanê

Ez dikarim bêjim îro ji bo min mucîzeyek bû. Dîtina efsaneyaya mezin Şivan Perwer ku xwediya stranên yekem ên ku min di zarokatiya xwe de bihîstibûn gelek xweş bû. Dema ez zarok bûm, min soz da xwe, ger rojekê Şivan Perwer konserek bide û ez li wê cihê bim, teqez ez ê herim konserê. Ji bo min gelek bi wate ye, bi saya wî min xwe nas kir, nasnameya xwe nas kir. Wî kurdî fêrî min kir. Ez li Stenbolê ji dayik bûm û li wir mezin bûm. Ew yekem kes e ku axa me û zimanê kurdî bi min da hez kirin.

Ez xwe bi şans û siûd dihesibînim ku bi Şivan Perwer re di heman serdemê de dijîm. Salên ku kurdî qedexe bû, min bi dizîka li bandên Şivan guhdarî dikir û hema hema hemû stranên wî jiber kiribûn. Hêj wê demê min bi Kurdî nedizana. Ez spasiyên xwe pêşkêşî Şivan Perwer dikim ji ber ku keda wî gelek mezin e li ser min. Bi saya wî bi kurdî diaxivim.

CIWAN HACO LONDON RAKIR GOVENDÊ

EROL BAŞAK





Stranbêjê Kurd ê navdar Ciwan Haco meha çûyî li Brîtanyayê du konser dan. Ewîl 24ê Hezîranê li Manchesterê roja din 25ê mehê jî li Londonê derket ser dikê. Her du konser jî organîzasyonên piçûk bûn. Li bajarê Manchesterê piranî gelê me yê ji Başûrê Kurdistanê hene. Konsera wir li eywaneke dawetê hate kirin. Hejmareke diyar ya guhdaran bi malbatî guhdariya Ciwan Haco kirin.

Konsera li Londonê jî li gorî konsera Manchesterê li eywaneke mezin pêk hat. Dora hezar kesî hatin vê konserê.

Stranbêjê Kurd Ciwan Haco dora du saetan li ser dikê ma û bi stranên xwe gelek caran yê li eywanê rakirin govendê.

Piştî konserê tevî wextê wî yê kêr Ciwan Haco ji The Hall Kurdîyê re axaftineke kurt kir û konser nixand.

Xort bûm, li Almanyayê min pêwistiya konseran dît.

Xweş bû London. Konser baş derbas bû. Me wextekî xweş bo-rand. Pir xweş bû. Xort bûm, li Almanyayê min pêwistiya konseran dît. Min digot lazime konserên Kurdan çêbin. Gerek şevên me yê Kurdan hebin. Gerek Newrozê me berdewam bin lê gereke konserên Kurdan jî berdewam bin. Piştigirîya wan bikin, ne tenê ya min ya xortan bikin. Herin konseran. Hêvîdar im konserên Kurdan her çê bibin. Ez girîng dibînim. Îro, raste li welêt rewş hebki zehmet e. Lê îro Kurd li Ewropayê pir in. 3 milyon Kurd li Ewropayê hene. Em dikarin konserên xwe li dar bixin, em xizmeta miletê xwe bikin, em xizmeta welatê xwe bikin baş dibe. Hêdî hêdî piştî vê pandemiyê em dest bi karê xwe dikin.

Hûnermendê gewre aniha rewşa muzîka kurdî baş dibîne

Rewşa muzîka kurdî baş e, ez xirab nabînim. Rast e însan bêwelat be zehmet e, ji çar alî ve em wilo ne pêşketîne. Ji layê muzîkê wê ji sedî sed kêmasiyên me hebin. Lê ez xirab nabînim

ez baş dibînim. Gelek dengên xweş ji xortên Kurdan derdikevin, hene, distirînin. Bi xêra gîtarê jî karê wan hêsantir bûye. Ez serkeftinê ji wan re dixwazim. Êdî divê nîşeke nû derkeve. Em hêdî hêdî porspî dibin êdî. (Dikene). Kesên nû yê xort, gênc gerek derkevin. Gereke piştigirîya wan bê kirin. Miletê me li vir heye. Gereke ew li vê derê piştigirîya konserên me bikin. Ez pêwist dibînim, pir pir pêwist û girîng dibînim vê yekê.

Ciwan Haco ji bo payîz û zivistanê mizgîniya konseran da.

Niha me wek destpêkê çend konser dan, li Parîs, Manchester û Londonê. Em ê ji bo vê havînê bêhnvedanekê bixin navberê. Li Payîzê û zivistanê em ê dest bi tûreka nû ya konseran li ewropayê bikin, ev ji sedî sed e.

Şeveke bi şahî û coş û ken li dar ket.

Di konserê de keçeka Rojavayî gulên ku ji Efrînê anîbûn diyarî dan Ciwan haco.

Kesên hatibûn konserê piranî keç û xortên ciwan bûn. Gelek ji wan jî cara yekem guhdariya Ciwan Haco kirin. Nexasim gelê me yê Bakurî. Lewra xelkê Bakur ji ber qe-dexyan bi salane ji dîtina hûnermendên gewre yên mîna Ciwan Haco bêpar in.

Hestên Hin Beşdarên Konserê

Duygu Dogan: Ciwan yek ji girîngtirîn mûzîkjenê zaroktiya me ye. Em bi stranên wî mezin bûn. Albûma wî ya sala 1983an beriya ku ez werim dinê derketibû. Min îro lê guhdarî kir. Yekem care ez zindî dibînim û lê guhdarî dikim. Ez xwe gelek bisiûd dihesibînim. Hêvîdar im em hê salên dirêj bikarin zindî guhdariya wî bikin û deng û stranên wî me ji xwe ve bibe. Ez gelek şa me ku min ew guhdarî kir. Herî zêde min ji kilama "Diyarbekir mala min e" hez dikir û îro jî ciwan zindî got, min li wî guhdar kir. Gelek xweş bû.

Nalî Raouf: Bi rastî konsereke nûwaze bû. Atmosfereke bêhempa hebû. Cara yekem e wî dibînim û guhdariya stranên wî dikim. Mûzîk û enerjîya Ciwan zehf xweş bû. Stranên wî dengê, wî gelek xweş bû. Ew bo min tê maneya her çar perçeyên Kurdistanê. Ji bo min ew gelek tişt e.

Deniz Özdemir: Ciwan Haco navekî mezin e ku di salên 90î de li cihekî dûr muzîka Kurdî ya hemdem çêdikir û ji bo cîhana Kurdî ya nûjen hêvî dida me ciwanên Kurd ên lîseyê. Temaşevan û guhdarên wî ne mîna muzîkhezên ji rêzê ne ku bes bixwazin Ciwan Haco bibînin biçin konserên wî û pê re wêneyan bikşînin. Ew girseyeke cidî ye ku difikire, analiz dike, şîrove dike û bi muzîkê re têkiliyek wan heye. Tê bîra min ku gelek hevalên min, çî Tirk bin û çî Kurd bin, di salên 90î de li Tirkîyeyê Ciwan dizanîbûn û guhdariya wî dikirin, ev yek min kêfxweş dikir. Ew ji bo me hunermendekî gewre ye ku çand û zimanê Kurdî hînî rêxistinên sosyalîst ên Tirk kir û mûzîka Kurdî ya hevdem gi-hand gelên cîhanê. Ji bo min kelecaneke mezin bû ku cara yekem li Londonê beşdarî konsera hunermendekî wisa mezin bûm. Tevî akustîka xerab a salonê û organîzasyona neprofesyonel dîsa jî bes ku Ciwan li wir bû û deng da me, em kêfxweş bûn. Ji ber ku me wek xwendekarên lîseyê yên salên 90î, guh dida hemû rêzîkên ku Ciwan dinivîsand, noteyên ku wî çêdikirin. Her albûma ku wî derdixist wek bersiveke nûjen bû li hember zilm û zordariya ku em di jiyana xwe ya rojane de dijîyan. Bi hêviya ku Ciwan bi rêxistinên profesyonel ên baştir re muzîka Kurdî bibe her derê cîhanê...



KITÊBA MUQEDES ERD Û ASÎMAN

NECAT ZIVINGÎ

Pêşîyên Kurdan ji bo berhemên pîroz
“kitêb”, ji bo yên din “pirtûk” gotine.
Ez ê jî di vê nivîsê de gotina “kitêb”ê
bi kar bînim.

Di dîroka mirovahîyê de gelek
metn û pirtûk rasterast wek kitêbên
muqedes (pirtûkên pîroz) hatine dîtin
û bi hezar salan bandoreke mezin
li civak û miletan kirine. Tewrat,
Zebûr, Incîl, Quran, Vîda, Trîpîtaka,
Wou Kîng, Avesta, Mushefa Reş,
Serencamname hinek ji wan in.

Peyva pîrozbûnê bi xwe
pêşbiryarekê pêk tîne û gelek derf
û paceyan li ber têgihîştinê digire.
Xwendina kitêbên muqedes pîrî
caran mirovan ji rastîyê dûr dixê.
Lê bi mêzîna eqî û zanistê, bersiva
gelek pirsan jî di xwe de dihewînin.



Roja yekê ya Remezana 2022yan min Kitêba Muqedes girt destê xwe û tê de derketim rêwîtiyekê. Li gor bawerîya misilmanan Quran di Remezane de daketiye. Lewma misilman herî zêde di Remezane de Quranê dixwînin. Lê çi xwendin! Li vê rasthatinê bişirîm. Ji ber ku bi salan e min di Remezanan de Quran xwendibû! Vê carê kitêbeke din li ber destê min e. Navê wê Kitêba Muqedes e; lê helbet ez ê weke bawermendekî nexwînim.

Kitêba Muqedes ji Tewrat, Zebûr û Incîlê pêk tê. Ji bo herduyên pêşî Peymana Kevn, ji bo Incîlê jî Peymana Nû tê gotin. Peymana Kevn, kitêba muqedes ya Cihûyan e. Bi lbranî û Aramî hatîye nivîsîn. Ji 3 beşan pêk tê: Pirtûkên qanûnê (5 kitêbên Mûsa), Pêxember û pirtûkên dîrokê, mezmûr. Peymana Nû (Incîl) bi Grekî hatîye nivîsîn û bi giştî ji jîyannameya Îsa û peyrewên wî pêk tê. Fille, herdu peymanan jî muqedes dibînin.

Dema mirov Kitêba Muqedes bigire destê xwe, divê ne li benda pirtûkeke weke Quranê be. Ne bi şewaz, ne bi naverok. Tenê Zebûr ji ber helbestkî ye, dişibihê. Naxwazim danberheva Quranê û Kitêba Muqedes bikim. Lê cudahiya herî dîyar ev e: Qur'an bi zimanê xwedê diaxive û metnekî krîstalîze ye. Kitêba Muqedes bi zimanê mirovan e. Bi qencî û xirabîyên xwe li hemberî me dîmenekî mirovî heye. Xwedê jî antropomorfîk e. Hinek caran Mûsa qehra wî aş dike... Pêxember mirov in; ne milyaket. Guneş û sûc û qusûrên wan hene. Dawid dema Bat-Şeva dibîne dil dikeviyê, mêrê wê Êrîya dişîne sengerên şer yê mirinê, piştî di şer de dimire, bi jina wî re dizewice û ji vê zewacê Silêman çêdibe. Çîrokên bi vî awayî pir in.

Di rûpelên destpêkê yê Tewratê de Afirandin heye. Çîroka afirandina mirovî. Gelek balkêş e. Xwedê Adem ji axê diafirîne, henaseya jîyanê pif dike pozê wî. Wî datîne Adenê, ku li roj-

hilat e. Çar çem tê de diherikin: Pîşon, Gîhon, Dîcle, Ferat. Dara zanîna başî û xirabîyê, lê qedexe ye. Ji bo tenêtiyê nekişîne, wek alîkar jin tê afirandin. Erê! Di hemî kitêbê de ziman û awir, pederşahî û patriarkal e. Ji bo ji wê darê bixwin, çavê wan vebe, qencî û xirabîyê ji hev derxin, mar wan dixapîne. Jin dixwe, dide mêrê xwe û çavê wan vedibe. Serpêhatî bi vî awayî dest pê dike. Têra xwe hûrgilî hene.

Tewrat tim weke beşên destpêkê ne fantastîk e. Ji ber ku kitêbeke neteweyî ye. Weke kronîka Cihûyan e. Dîrok û dara êl û eşîrên wan e. Yahûdî (Cihû) neteweya bijarte ya xwedê ne. Dema mirov Tewratê dixwîne çêtir fêm dike bê Cihû çawa di nav wan pêl û bobelatên dijwar ên dîrokê de hebûna xwe parastine û winda nebûne.

Piştî qanûnên cizayên kuştinê, hişkî û tundîya Tewratê, mirov di rewanîya Mezmûran de hinekî bêhna xwe vedide: "Bextewar e yê gihaye zanayîyê / Yê hiş dîtiye / ... / Zanayî dara hebûnê ye, bextewar in yê xwe pêgirtine." Pesnê aqil û zanatîyê tê dayîn, ji ber ku "Reb bingeha cîhanê li ser zanayîyê danîye". (Pendên Silêman, 3/13, 18, 19)

Îcar beşa Neşîdeya Neşîdeyan (Newaya newayan) bi her awayî helbesteke erotîk e. Jin wiha hesreta yarê xwe dikêşe: "Bila min bi lêvên xwe ramûse heta dikare / Lewra hezkirina te ji meye şîrîntir e." Sermestî heye di vê beşê de: "Ax, çi qas delal î, hezkirîya min, ax, çi qas delal /

Her çavêkî te weke kevokekê!" (Zebûr, Newaya Newayan, 2, 15)

Incîl ji yên din bêtir kitêba dilovanî, dilsozî û dîn e. Îsa tim şîretên xwe bi şibandinên balkêş dike. Derî ji hiş re vedike. Yehyayê Mêrûnker (Waftizvan) berya Îsa derketîye û nav daye. Keyê herêmê Hîrodes bi daxwaza Hîroda ya jina Filîpûsê birayê xwe, Yehya dide girtin. Di pîrozbahîyên rojbûna Hîrodes de keça Hîrodîya wek xelata reqsa xwe sere Yehya dixwaze û sere wî tê jêkirin. Çîrokên wisa balkêş hene.

Îsa, mafê mirovan di ser îbadetan re digire. Li hember dîn-firoşan tédikoşe: "Ez vê ji we re bejim: heya rastîya we melleyan û Ferîsîyan derbas neke, hûn nikarin bikevin serdestîya asîmanan." (Matta, 20)

Di Incîlê de Matta, Markos, Luka û Yûhanna bi giştî dûbar-eya heman çîrokê ne. Her yek bi şêwaza xwe. "Destpêkê gotin hebû" hevoka yekem ya Yuhanna ye. Û bi ya min di Incîlê de beşa herî xweş jî ev e.

Tewrat netewe û dîrok e, Zebûr hest û helbest e, Incîl heqîqet û irfan e. Di her sêyan de jî çêja muqedesîyê heye. Yan ji ber pêşbiryarê, yan ji ber Reb diaxive, yan jî ji ber metnên hezar salan in. Lê heye. Herî zede di Incîlê de.

Mirov li pir gotin û vegotinên Quranê û yên misilmanan rast tê. Ji ber ku çavkanî yek in û dîn eklektik in. Mînak: "Sedeqeya deste we yê rastê dide, bila deste we yê çepê pê nehise." (Matta, 6/3)

Di Kitêba Muqedes beşa Yeşaya de pêşîyên Kurdan Medî wek neteweyeke ku "Qedir nadin zîvî, ji zêran hez nakin" tèn nasandin û tê gotin ku xwedê bi deste wan dixwaze "quretîya Kildanîyan ya bilind, keyatîya herî delal Babilê" birûxîne.

Dema mirov kitêbên muqedes dixwîne, rewş û refleksên civakan çêtir tédigihê. Bi taybet şaristanîya rojava û cîhana misilmanan. Pêwîstîya misilmanan bi daketina erdê heye, ya Fille û Cihûyan bi derketina asîmanan. Lê ew bi balafiran pêdivîyên xwe dibinin; divê misilman bibin mirov.

Nexwe em vegeerî destpêka afirandinê. Belkî çar çemên li Adenê mîtolojî, dîn, felsefe û zanist bin. Herduyên pêşî xewn û xeyal (şev), herduyên din hiş û hebûn (roj). Hev temam dikin. Me ji serpêhatîya mirovahîyê agahdar dikin. Mirovahî çawa amûran diafirîne, bi wan pêwîstîya xwe û pêşîya xwe dibîne. Lê dîsa bi heman amûran mêmîyê xwe dixitimîne, jîyanê difetisîne. Rast e: "Kesek heta ji nû ve newelide nikare serdestîya xwedê bibîne." (Yuhanna)



DENGBÊJÎ LI RADYOYA ÛRMÎYEYÊ Û DENGBÊJ ÎRAN XANIMA MUCERED

SEWÎM QOSERÎ





Dengbêjî çandeke kevnar e ku hemû hêmanên çanda kurdan di xwe de dihewîne. Tradîsyona çanda devkî ye. Êş û azarên miletekî, çîrokên evînî, qehremanî û mêranyî, kêf û şadî, hezkirin û hwd. mijarên sereke yên dengbêjiyê ne. Ev mijarên curbicur bi awayekî hunerî û estetîk ji aliyê dengbêjan ve bi rengê nû ve tînen veguhestin. Yanî dengbêjek dikare mijara kilama xwe bi efsaneya miletê xwe, bi serboriyên xwe yan jî bi serboriyên derdora xwe bi awayekî rengîn estetîze bike. Dengbêj bi çanda devkî mezin bûne û şert û mercên civaka xwe, keleş û keleşopiya xwe baş dizanin û vê jî bi hafizayeke xurt dixemilînin. Hin dengbêj kilamên xwe bi enstruman, hin ji wan jî bêenstruman strane. Em bi riheftî dikarin bibêjin ku dengbêjek hem şair û muzîkjen hem jî edebiyatzanek e.

Kilamên dengbêjan bi her awayî, çi evînî çi qehremanî be riheftî neteweyî di nava gel de pêk tîne. Kurdek di kilamekê de dikare hestên xwe, bîr û baweriyên xwe, êşên xwe, erdnîgarîya xwe û tarîxa xwe bibîne û hîs bike. Ev jî hişmendiyê neteweyî pêk tîne û tesîreke mezin li gel dike. Gelek dengbêj mal bi mal, gund bi gund geriyane û li dîwanan, kilam gotine. Em dikarin bibêjin ku ev dengbêjên dîwanan xweyî kêm guhdêran bûne. Çimkî tenê bi malek yan jî bi gundekî sînokirî mane. Digel vê hin dengbêj jî bi saya dezgehên ragihandinê yên wekî radyoyan gihîştin hemû bajarên derveyî welêt. Radyoya Êrmiyê yek ji van radyoyan e ku di sala 1969an de li rojhilatê Kurdistanê di hundirê hefteyekê de bi tevahî saetek dest bi weşana Kurdî kiriye (Mahabad, 2022, Bernamegeh). Piştê di hundirê heftê de rojê du saet di Radyoyên Tehran û Kirmanşahê de weşana Kurdî dest pê kiriye. Gundiyek, bajarîyek di heman demê de bêyî ku hev nas bikin li heman radyoyê bi heman hestî guhdarî kirin. Ev hest di nava Kurdan de çi bi zanetî çi bi nezantî hestek û riheke hevpar û neteweyî pêk anî.

Ji bilî Radyoya Êrmiyê, Radyoya Êrîvanê di sala 1955an de di hefteyê de sê car êvaran

15 deqe, paşê di demsala payîzê de nîv saet, piştî saleke din jî saetek dest bi weşana Kurdî kiriye. Radyoya Bexdayê jî di sala

1939an de rojê 15 deqîqe dest bi weşana Kurdî kiriye. Di sala 1954an de jî saetek weşana Kurdî kiriye (Elend, 2021: 82-90). Bi hezaran kilamên dengbêjan hatin arşîvkirin. Bi saya van radyoyan gelek dengbêj bi deng û kilamên xwe hatin naskirin. Bi taybetî jî dengbêjiya jinan zêdetir bal dikêşa. Rewş û atmosfera Rojhilata Navîn ji bo jineke ku pêşengiya çanda neteweyê xwe û hunera xwe bike zehmet bû, lê gelek jinên Kurd ên dengbêj dengê xwe û rengê çand û hunera xwe li hemû dinyayê belav kirin. Ji van dengbêjan çend kes ev in; Ezniva Reşîd, Sûsika Simo, Meyremxan, Eyşe Şan, Elmas Xan, Zadina Şakir, Nesrîn Şêrwan, Aslîka Qadir, Sîma Bîna, Xanim Baqirî, Gulbihar Amedî, Fatma Îsa, Dayika Cemalî, Fetane Walidî û hwd. (Yaş, 2020, Dilop). Yekem car li Rojhilatê Kurdistanê bi navê Îran Xanima Mucerrred li Radyoya Êrmiyê dengbêjê jin bi awayekî fermî bi zaravayê kurmancî straye. Helbet beriya Îran Xanimê jî gelek jin di nava malbatan de, li gundan li dawetan û daxwazên derdora xwe gelek kilam strane. Li Xorasanê yekemîn car Nene Qemerûnî û piştî wê Banû Şêrwanî dest bi kilamgotinê kirine. Li mîntîqa Mukriyanê Menic Heyran di dawet û şahiyên de straye. Li mîntîqa Sinê Fetane Welidî straye. Li Kirmanşahê jî yekem car Qemer Benî Erdelan, Xanim Baqirî û Mestûre Esedî kilam gotine. Li Bakurê Kurdistanê weke yekem car Gula Fille tê zanîn lê dengê wê tune.



Loma em dikarin bibêjin yekem car Meryemxan straye. Li Başûrê Kurdistanê jî yekem car Gulbihar û Fewziye Mihemmed ku her du xwişk bûn, strane. Di nav kilamên wan de nimûneyên evîndarî, hişyarî, gilî û gazin û bangên neteweyî hene (Oramar, 2016, Bernameya Awaz).

Radyoya Ûrmîyeyê û Weşana Wê Ya Kurdî

Mintiqeya Ûrmîyeyê xwediyê dîrokeke qedîm û kevnar e. Gelek bûyer û serboriyên dîrokî li vê mintiqeyê qewimine. Loma bajarê Ûrmîyeyê navendeke çand û hunerê ye. Di gelek berhemên kevin de behsa bajarê Ûrmîyeyê û rewşa xweserbûna wê hatiye kirin. Ji gelek medeniyetan re bûye wekî paytext. Her gav ev bajar û herêma wê ya kevnar û qedîm bûye hêlîna kelepura Kurdî. Ev herêm bûye navenda gelek dengbêj, heyranokbêj û hunermendên navdar (Oremer, 2016, Bername Awaz). Kilamên wan, deng û awazên wan bi

awayekî gihiştîye heta derveyî welêt jî. Ev kilamên dengbêjan; çî evînî çî qehremanî be rihekî neteweyî di nava gel de pêk aniye. Ji ber ku kurdek di kilamekê de dikare hestên xwe, bîr û baweriyên xwe, êşên xwe, erdnîgariya xwe û tarîxa xwe bibîne û hîs bike. Ev jî tesîreke mezin li mirovan dike. Gelek dengbêj mal bi mal, gund bi gund geriyane û li dîwanan kilam gotine. Em dikarin bibêjin ku ev dengbêjên dîwanan xwediyê kêr guhdêran bûn. Çimkî tenê bi malek yan jî bi gundek sînorkirî mane. Digel vê jî hin dengbêj bi saya dezgehên ragihandinê yê wek radyoyan gihiştin hemû bajarên derveyî herêma Rojhilata Kurdistanê. Radyoya Ûrmîyeyê yek ji van radyoyan e ku di sala 1969an de li rojhilatê Kurdistanê di hundirê hefteyekê de bi tevahî yek saet dest bi weşana Kurdî dike. Heke kêr be jî jinên dengbêj (bêyî rewşeke fermî) li devera Ûrmîyeyê hebûn. Di radyoyê de cara ewil Îran Xanima Mucered li ser daxwaza dengbêj Xalê Birê, Mistefa Elîzade û Hemîd Yûsûfî di sala 1971ê de weku temsîlkarên dengbêjên jin bi awayekî fermî li Radyoyê Ûrmîyeyê dest bi kilamgotinê dike. Ji bilî Îran Xanima Mucered, Îbrahîm Newrozî (Dengbêj Xalê Birê), Hemîd Yûsûfî, Mistefa Elîzade jî dengbêjên bi nav û deng ên Radyoya Ûrmîyeyê bûn. Dengbêj Xalê Birê li radyoyê gelek kilam gotine. Wî bi xwe bo nêzî şeşsed kilaman beste çêkiriye. Hemîd Yûsûfî û Mistefa Elîzade jî bi deng û awazên xwe gelek xizmet dane. Di Radyoya Ûrmîyeyê de gelek kilam hatin arşîvkirin. Piştê di hundirê hefteyê de rojê du saet li Radyoyên Tehran û Kirmanşahê dest bi weşana kurdî dike (Mahabad, 2022, Bernamegeh). Bi rehetî em dikarin bibêjin ku gundiyeke, bajarîyek di heman demê de bêyî ku hev nas bikin li heman radyoyê bi heman hestî guhdarî dikir û hest û hişmendî di nava Kurdan de çî bi zanetî çî bi nezantî hestek û rihekî hevpar û neteweyî pêk anî.

Îran Xanima Mucered û Cihê Wê di Radyoya Ûrmîyeyê de

Îran Xanima Mucered di sala 1950-1951an de li rojhilatê Kurdistanê li gundê Înkesûya li herêma Biradostan ji dayik bûye ku ew der niha girêdayî bajarê Ûrmîyeyê ye. Navê dêya wê Perîşan bû. Navê bavê wê jî Ebdurrehman bû. Malbata Îran Xanimê malbateke feqîr, cotkar û karker bû. Ciwaniya wê di nav malên dewlemend û mezin de wek karker derbas dibe. (Oramar, 2016: Bername Awaz).

Îran Xanim hêj di ciwaniya xwe de dest bi kilamgotinê dike. Li dawet, şahî û şînan gelek kilam, stran û zêmar gotine. Bi ciwanekî re dizewice ku navê wî Seîd e û ew jî ji herêma

Ûrmîyeyê ye. Paşê ew û hevserê xwe Seîd diçin gundê Somanawa, li wir niştecih dibin. Du kur û qîzeke wan çêdibe. Îran Xanim dev ji kilamgotinê bernade û bi hevserê xwe Seîd re diçin dawet, şahî û malên mezinan stranan distrin. Hevserê wê Seîd gelek piştgirî dide wê. Îran Xanim di sala 1970-1971an de bi awayekî fermî di beşa Kurdî ya Radyoya Ûrmîyeyê de dest bi kilamgotinê dike. Li gorî gotina hin kesan jî Îran Xanim bi qîza xwe Gulistanê re diçû radyoyê û berî ku bibe êvar jî dihatin malê bo ku peyv û gotinên nexweş derbarê wan de neyên gotin û bihîstin. Çimkî di nava civateke eşîrî de bi tena serê xwe çûyîna radyoyê û kilamgotina jinekê wêrekîyek û xîrekeke



mezin dixwest. Di wê demê de Îran Xanimê wê rewşa hişk û tund a li hemberî jinan, bê tirs şikand û dengê wê li herêmê her ku diçû belavtir dibû. Tenê ne li Rojhilatê Kurdistanê, li Bakurê Kurdistanê jî dengê wê bi taybetî jî li bajarê Hekarî, Wan û Agirîyê belav û naskirî bû. Îran Xanimê bi sedan kilam gotine. Tê gotin ku wê sih û yek sal dengbêjiya xwe domandiye. Hinek ji kilamên wê ev in: *Arifo Lawo, Bajo Emrê min, Delal Ez Bi Heyran, Bavê Lalo, Delal Lo, Delalê Malê, Lê Meyrê, Bavê Edo, Bavê Filît (Axao), Wey Narîne, Lêlê Yeman (Domamê), Werî Lêlê (Zerîyê), Bavê Firhê* û hwd. Her ku diçû hezkiriyên dengê Îran Xanimê li bakurê Kurdistanê zêdetir dibûn. Çûn û hatina Îran Xanimê ji bo kilamgotinê li Radyoya Ûrmîyeyê heta sala 1979î didome. Paşê bi Înqilaba Xumeynî ra kilamgotina Kurdî li radyoyê qedexe dibe, rewş zehmettir û xirabtir dibe, bi giştî ji bo hemû Kurdan û bi taybetî jî rê li ber xebat û hunera Kurdî tê girtin. Vê guherînê ji bo hunerhez û dengbêjan zordestîyeke mezin bi xwe ra anîbû.

Piştî demekê di sih saliya wê da hevserê wê Seîd hewiyê tîne ser Îran Xanimê û ev yek tesîreke mezin li Îran Xanimê dike û roj û demên pir dijwar derbas dike. Ew dev ji hevserê xwe û zarokên xwe berdide û diçe. Demekê li cem malbavanê xwe dimîne. Midetek şunda bi Dadaş Nasirî re dizewice û li Tehranê bi cih dibe. Piştîre ji Tehranê dîsa vedigere Ûrmîyeyê û dikanekê vedike, debara xwe bi vî şikilî diborîne. (Oramar, 2016: Bername Awaz).

Nîşe: Ev gotar ji du beşan pêk tê. Beşa duyem dê di hejmara Tebaxê de cî bigre.

ASEM NORIK MUSOYAN

NÎGARXÊZÊ CIWAN

HEVPEYVÎN
EROL BAŞAK

Asem Norik Musoyan, xortekî Kurd ê Êzdî ye. Li Moskowê dijî. Norik hê 19 salî ye, lê bi hûnera xwe li Rûsyayê balê dikşîne ser xwe. Ew nîgarxêz e. Resmên ku wî xêzkirine di pêşbaziyan de xelatan werdigrin. Ew bi hunera xwe ji bo pêşerojê hêviyê dide.

Me bi vî xortê serkeftî re hevpeyvînek çê kir. Werin Norik Musoyan binasin.

Norik tu hunermedekî ciwan î. Pêşî dikarî hinekî behsa xwe û malbata xwe bikî?

Navê min Norîk Mûsoyan e, ez li Moskowayê dijîm, 19 salî me, li Ermenîstanê hatime dinê, bav û kalên min di destpêka sedsala 20an de ji Wan û Qersê koçî wir kirine. Ez ji malbateke jîr tîm, diya min û dapîra min mamoste ne, bapîrê min doktorîyê dike, xwişka min xwendekara zanîngeha bijîşkîyê ye û birayê min ê piçûk li dibistanê dixwîne. Wekî din, ez zanîngehê dixwînim ku bibim mîmarekî serkeftî.

Te çawa dest bi hûnera resmê kir?

Min di heft saliya xwe de dest bi xêzkirinê kir; min kopyayên tabloyên hûnermendên navdar çê dikirin, min şikl û eşqalên mirovan xêz dikir. Paşê ez ketim dibistaneke hûnerî, li wir min bi berfirehî hûnera bedew xwend.

Tu bi taybetî resmên çi çêdikî, di nîgarên xwe de tu behsa çi dikî û bi kîjan teknîkan dixebitî? Dikarî hinek mînakan bidî?

Ez li ser mijarên cûrbecûr tabloyan xêz dikim. Wek mînak jiyana rojane, peyzaj, mîmarî, portre. Ez materyalên hûnerî yên cihêreng bikar tînim: avî, gouaş, qelem, rûn. Gelek berhemên min li ser mijarên neteweyî ne ku ez jiyana û edetên kurdan, cil û bergên neteweyî û taybetmendiyên derveyî çanda kurdî vedibêjim. Her wiha mijara mîmarîyê di afirînerî de cihekî taybet digire. Ez bi taybetî bala




xwe didim wê. Di berhevoka berhemên min de xêzên tam, fantazyên mîmarî, proyeyên avahîsaziyê jî hene. Erdnîgar celebê min ê bijare ye. Pratîka xêzkirinê ya li derve çalakiya herî xweş a hunermendekî ye. Berhemên min di qalibên cuda de hatine çêkirin; hem karên mînyatur û hem jî yên mezin hene.



Tu xortekî Êzdî yî. Li ser çanda Êzdiyan xebatên te yên çawa hene?

Ez wek Kurdekî Êzîdî qîmeta çanda miletê xwe dizanim û rêzê lê digirim. Ez di berhemên xwe de hewl didim ku dîroka Kurdên Êzîdî ya tevlihev û sedsalan ragihînim. Avahiya mîmarî ya bêhempa ya Laleşê, sembolê olî ya tawîs, destan û çîrok jî di berhemên min de cih digirin.

Berhemên te di pêşaziyan de xelat wergirtine. Tu beşdarî kîjan pêşbirkan bûyî? Ew berhemên te yên xelatgirtî derheqê çi de bûn?

Di sala 2017an de, min di ansîklopediya zarokên bextewar ên Rûsyayê de cih girt; Ez beşdarî pêşbirkên werzîş û muzîkê bûm, li wir min dereceyên bilind girtin. Sala borî, di 21ê Nisanê de, li Enstîtuya Rojhilatnasiyê ya li Akademiya Zanistî ya Rûsyayê, beşdarî konferanseke bi boneya 30 saliya damezrandina herêma bêmirov li Kurdistanê bûm. Li wir pêşangehek ji berhemên min hat lidarxistin. Dinar Mustafa Nûnerê Hikûmeta Herêma Kurdistanê li Rûsyayê ji bo lidarxistina pêşangehê spasiya min kir û ez bi dîploma xelat kirim. Her wiha ez beşdarî pêşbirkên cûrbecûr yên navneteweyî di warê afirîneriya hûnerî de bûm. Di pêşbirkên wek abstracum, hefteya wênesaziyê û Kupaya Rûsyayê de min dereceyên 1em, 2yem û 3yem girtin. Heta îro 5 pêşangahên min ên takekesî li bajarên cuda yên Rûsyayê hatine lidarxistin: Tver, Torzhok, Krasnogorsk, Moskow, hwd. Ez beşdarî konferanseke xwendekaran bûm, li Enstîtuya Mîmarî ya Moskowê.





Min li ser mijara “Berhevdana sîstemên rêzikên mîmariya Ermenî û Bîzansî” pêşkêşiyek kir û ev wek gotar di berhevoka xwendekaran de cih girt. Ez li Moskowê jî bûm xwendekarê salê, li wir di beşa afirîneriyê de ez bûm yekemîn.

Li Moskow û Rûsyayê ci-vateke çawa ya Kurdan û bi taybetî Kurdên Êzdî heye? Xelkê Rûs ji bo Kurdan çi difikirin?

Li Moskowayê dîasporayeke mezin a Kurdan heye. Kurdên Êzdî hê jî hewl didin ku çand, ziman, û kevneşopiyên xwe biparêzin, piranî zewacên di navbera etnîkçon cuda de napejirînin ku asîmîlasyon çênebe. Lê mixabin her ku diçe, parastina çanda neteweyî diwartir dibe, ji ber ku ciwanên nû kêmbi kok, paşeroja dîrokî û bi giştî çanda xwe re eleqedar dibin. Rus bi Kurdan re pir baş tevdi-

gerin; firsendê didin wan ku bi pêş ve biçin. Li Rûsyayê gelek doktor, mamoste, hûnermend, endezyar û hwd. Kurdên hêja dijîn. Ew ji welatên Transkafkasyayê, bi giranî ji Ermenîstanê tên.

Tu gelek ciwanî û hê dixwîni. Xwendina te li ser çi ye? û Hedefên te çi ne?

Ez li Enstîtuya Mîmarî ya Moskowê dixwînim. Min pîşeya mîmariyê hilbijart, ji ber ku ew zanistên afirîner û endezyariyê li hev dike û ew pîşe gelek tê tercîhkirin di sedsala 21an de. Di pêşerojê de plan dikim ku gelek projeyên xwe yên mîmarî li Rûsya û Kurdistanê pêk bînim û bûroya xwe ya mîmariyê vekim.

Di warê nîgarxêziyê de tu kîjan hûnermandan dişopîni? Îdolekî te heye?

Ez hunermendên nûjen ên Rûs, Ewropî û Amerîkî

dişopînim ku bi şewaza realîzm, akademîzm, abstractionîzm û oryantîzmê dixebitin. Mînak, hunermendên wekî Brusilov, Bozhkov, James Garmy, hwd., mîna tabloya klasîk a sedsalên 19 û 20î (Kuindzhi, Levitan Repin, Serov, Kustodiev, Fenshin, hwd.), û her weha wênesaziya Ronansa Îtalya û Bakur (Mi-






chelangelo, Raphael, Durer, Jan Vermeer, hwd.) û nîgarxêziya salonê ya Îngilîzan ku hunermendên Brîtanî yên sed sala 19an çêkirine bala min dikşîne. Wek nimûne, ez bi taybetî bi karê hunermendê navdar Joseph Solomon Joseph "Samson" re eleqedar im.

Tiştêkî din ku tu lê zêde bikî heye?

Armanca min ew e ku bibim mîmarekî xwedî tecrûbe û tevkariyê li dîroka gelê xwe bikim.

Zor spas dikim Norik Musoyan. Her serkeftina te dixwazin.



GIRINGIYA BERHEMÊN FOLKLORÎ

ZEYNELABIDIN ZINAR

pencinar.z@gmail.com





Îro li dinyayê her civatên ku wek netewe têne hesabandin, xwediyê ziman, tore û çandekê ne. Ji ber ku çand zagona jiyane ye, nexwe jiyana merivan bê hebûna çandê nayê domandin. Folklor jî, beşa herî xurt û xweş a wê çandê ye.

Folklor bi giştî ji van tiştan re tê gotin:

Wêjeya devkî, kevneşopiyên heyfî, tewr û awayên jiyane, urf û edet, baweriyên cuda, lîstikên cuda, şênîyên wek muzîkê, stran, helbest û ayînên olî ku li welatekî di nava aleciyên wî welatî de têne bikaranîn.

Peyva folklorê, di 1846an de ji aliyê lêkolînerê Îngilîz William Thomsî (1803-1885) ve hatiye bikaranîn. Piştê li nava neteweyên Arî belavbûye. Wateya FOLKê xelk e, ya LORê jî zanist e nasîn e bihev ve dibe û dibe xelknaşî.

Bêguman çî dema yek bixwaze ku zimanekî, çandekê û toreyekê rind nas bike, berî her tiştî divê ew pêşî çîrokên folklorê wê çandê bixwîne, lêkolîn li çîrokên wê yê pirtexlît bike. Lewra bi xwendina çîrokên folklorî, meriv rind civata xwediyê wê folklorê dinase û têdigîje ka ew ziman û ew çand, ji aliyê lawaztî û dewlemendiya xwe ve di çî radeyê de ne û nixê wan jî heta kîjan pileyê ye.

Ev hawe, ji bo rewşenbîrên Kurd pir girîng e ku ew naveroka berhemên Folklorê Kurdî bizanibin. Piştî pêzanîna wan divê Toriya Neteweyê Kurd jî bizanibin. Piştê ew bi hêsanî dikarin rengê

Civata Kurd şirove bikin û hem psîkolojiya wan, hem jî rewşa jiyanê çîroyê fêhm bikin.

Di Çanda Kurdî de ev babet hene: Gotinên Pêşyan, Kilam û Stiran, Bacî û Lawik, Mese-lok, Pêkenok, Leqemok, Lawij, Xweşbêje, Mamik, Şîret, Serpêhatî, Çîrok û Çîrvanok...

Di lêkolîna min a 12 salan de, 1.710 perçeyên folklorî berdest bûne û min ew di demên cuda de, bi navê XWENÇEYÊ di 10 cild pirtûk de weşandine.

Di nava Folklorê Kurdî de, tiştên herî xweş, çîrok û çîrvanok in. Hin çîrokên Folklorê Kurdî pir dirêj û hinek jî pir kurt in.

Wek mînak: Di Çîroka ABIDÊ ŞKEFTÊ de, sê dinyayên ji hev cuda hene. Hin çîrok jî hene pir kurt in, weke vê çîrokê: "Hebû kerek û hebû kundirek, kerê kundir kot û kot. Çîroka min jî ev bû ku min got."

Hin çîrok jî tenê li ser rawila (fabl) hatine gotin wek Çîroka Hecî Rovî.





Jixwe Çîroka GUL Û SÎNEM jî, pir navdar e û heft şaxên wê yên cuda hene.

Mîrze Mihemedê lehengê çîrokê, heft caran çûye Çîn û Maçînê (Manchurya) û bi Sînem Paşayê mêrê Gulê re xeberdaye û serhatiya wî û Gulêya keçma-ma wî, ji devê wî wergirtiye.

Di çîrokên folklorî de tewr û awayên jiyana neteweyî eşkere cih girtine. Herweha jiyana çînayetî û perwerdekirina merivan jî tê de xweş û eşkere bûne. Di çîrokan de balkêşî, fentezî, têkiliya kulturî, naskirina xwezayê, xweparastina li pêşberê rûdan, siqûmat û belayan, xwenasiya nijadî, baweriyaya bi xwe, heskirina ji zimanê xwe û hwd. cih girtine.

Bi xwendina çîrokên Folklorî Kurdî gelek tiştên ku bi hêsanî

nayên zanîn, têne dîtin. Bi wê yekê, dinyayêke bê sînor li pêşberê merivan vedikin ku meriv di tarîstaneke bêkevî de li rewşên û ruhniya zanistiyê rast dibe.

Çîroka Kurdî, xwe li sê parzemînan bi cih kiriye. Bi taybetî jî têkiliyêke xurt di navbera Kurdistan û Çînê de daye çêkirin.

Nexşeya ku di çîrokên folklorî de derketiye holê, weha ye:

Lehengên Çîrokên Folklorî Kurdî hertim ji Diyarbekir ber bi aliyê Rojavayê ve çûne û xwe gehandine Stenbolê, ji wir jî çûne Ewropa, li Spanyayê di tengava Cebelê Tariq re derbasî Efrîqayê bûne û li bakûrê Afrîkayê li gelek welatan geriyane, piştî çûne heta xwe gehandine Misrê, careke din berê xwe dane Yemen û di ser Ummanê re ve geriyane, di tengava Kurdên Lorî re li ser Çemê Dîcleyê xwe gihandine Diyarbekirê.

Çîroka bi navê GUL Û SÎNEM, di zaravayê kurmancî de 7 şaxên wê hene. Dema çîrokbêjek dest bi gotina çîroka Gul û Sînem dike, pêşî weha dibêje: "Dibêjin heft şaxên vê çîrokê hene, lê ez tenê yekê dizanim" û hêj dibêje...

Min di lêkolîna xwe de, çar şaxên çîroka Gul û Sînem bi dest xistine, lê hêj sê şax wenda ne.


Li gor wan belge û materyalên Folklorî Kurdî ku derketine holê, hertim Diyarbekir paytexta Çîrokên Folklorî bûye û girêdana xwe bi gelek welat û herêmên cuda (dûr û nêz) re daye çêkirin.

Ev 16 xalên li jêrê di Folklorê Kurdî de pir girîng in:

- 01- Gotinên Pêşîyan.
- 02- Kilam û Sitran.
- 03- Heyranok.
- 04- Lawik.
- 05- Bacî
- 06- Meselok.
- 07- Pêkenok.
- 08- Lawij.
- 09- Şiroveya Gotinên Pêşîyan.
- 10- Xweşbêje.
- 11- Mamik.
- 12- Şîret û Nesîhet.
- 13- Serpêhatî.
- 14- Çîrokên Rawilan (fabil).
- 15- Çîrokên Têkel
- 16- Çîrokên Dirêj

Her şad û bextewer bin...

Stockholm 09/ 06/ 2022



LI BAKUR Û TIRKIYÊ WEŞANGERÎ BER BI TÊKÇÛNÊ VE DIÇE

MEVLÛT OĞUZ

oguzmevlut@gmail.com | @mevlutoguz





Ciwanekî temenê wî li dora nozde-bîstan dikeve dikana pirtûk-firoşiyê, çenteyê xwe û kîsikê di destê xwe de datîne goşeyekê û bi baldarî berê xwe dide refê nû yê pirtûkan. Piştî qederekê du-sê heban hildibijêre lê dema tê ber kaseyê û dike heqê wan bide, pe-reyên wî li hev dernakevin, radihêje kitêbekê û kovarekê, yên din datîne, di ber xwe de dikelime û dibêje, bila ev jî bimînin carekê din. Ev demek e ji ber krîza aborî û bihabûnê, hal û hewalê gelek xwendevanan eynî wiha ye.

'Weşanxane ji mesrefan, xwîner ji bihayan bigazinc in'

Sektora çapkirin û weşangeriyê ji ber qeyrana aborî û bêîstiqrarî-ya dovîzê li ber îflasê ango li ber têkçûnê ye. Weşanxane ji ber mesrefan, xwîner ji bihayê pirtûkan bigazinc in. Weşangerên ku em bi wan re axivîn diyar dikin ku bi vî awayî ne mimkin e weşangerên kurd li ser piyan bimînin.

Weşanger teqez dikin ku pêvajoya wiha dewam bike, çend pirtûk-firoşên ku banka finansoriya wan dikin ne tê de, wê hemû weşanger îflas bikin û top biavêjin. Ew teqez dikin ku ji ber rewşa aborî ya niha gelek projeyan taloq dikin û nikarin pirtûkên nû bixin rojeva xwe, berovajî wê tenkîsatî di rojeva wan de ye.

Qeyrana aborî bi qasî ku bandorê li hemû qadên jiyane dike bandoreke neyînî li pirtûkfiroşan jî dike. Yek ji pirtûkfiroşên herfê kevin li Stenbolê, Pandora Kitabevî şaxa xwe ya li Beyoglu-yê ji neçarî digire ku 30 sal e ew şax vekirî bû. Medya Kitabevî, tekane pirtûk-firoşa kurdî li Stenbolê ye û zêdetirî çaryek sedsal xizmetê dide, Ji ber kirêya zêde hindik maye bê girtin û li hêviya çareseriyekê ye. Eger cihekî guncaw neyê peydekirin dê girtin bibe çarenûsa wê.

Li gorî agahiyên ku rêveber û xebatkarên sektorê didin, salek berê toneke kaxeze bi 615 Euro bû, niha bi 1200 Euro ye. Topek kaxeza A4an par bi 20-25 TLyî bû, niha bûye 100-120 TL. Kolîyek A4 bûye 400-500 TL.


"Hemû kel û pelên çapxaneyan ji derve tînin; kaxeza navê ji Norwêcê, berg ji Amerîkayê, sefalon ji Almanyayê, boyax ji welatekî din ê Ewropayê tê û ji ber vê jî çapkirin her diçe zehmettir dibe."

Xebatkarekî sektora weşangeriyê diyar dike ku wan li gorî par, zêdetir kitêbên kurdî çap kirine dibêje, "Em wek berê di karê çapkirinê de berdewam in lê rêjeya firotinê gelekî kêmtir bûye."

"Bihayê kitêban hema bêje her roj, her meh diguhere; xelk ji bihayê kitêban bi gilî û gazinc in. Bo nimûne, yek tê pênc kitêban hildibijêre lê sê heban dikire. Di pêvajoya kampanyayê de zêdetir eleqe çêbû lê wiha dewam nake, Ji bo berdewamiya bi rêk û pêk teqez hewcedarî bi alîkarî û sponsoriyê heye. Em ê hewl bidin serî li fonên navnetewî bidin."

'Kaxeze peyda nabe'

Gerîndeyê weşanxane û kovara Nûbiharê Suleyman Çevik, di postekê de ku li ser hesabê xwe yê medya civakî belav kiriye balê dikêşîne ser tunebûna kaxezan û dibêje, "Ecêba giran! Ewqas sal in em vî karî dikin, min dewreke weha nedît. Me bergên 6 pirtûkên zarokan (Seta Dilşayê) çap kirin, 10 roj in em kaxeze hundirê wan peyda na-



kin. Ferhenga Zazakî jî hevalê me bi zor û zehmetî kaxezê wê di heftayekê de peyda kir.”

‘Îsal dê kêmtir pirtûkên kurdî derkevin’

Koordînatore pirtukakurdî, Bawer Berşev wekî Çevik bedbîn e. Berşev, “Her diçe çapkirina pirtûkan zehmet dibe. Wiha dewam bike dê gelek weşanxaneyên kurdî bên girtin. Li gor par hema bêje 4 qat bihatir tên çap kirin. Ji xeynî mesrefên din. Ji xwe weşanxaneyên ku dijîtal çap dikin yan dê bên girtin yan jî li ber sekeratê bin. Weşanxaneyên ku stoka wan baş bin, dijîtal çap nekiribin, ofset û zêde çap kiribin dê demeke nêz de tengasî bikişînin jî piştî krîzê wê qezenc bikin. Texmîna min dê îsal li gor par %50 kêmtir pirtûkên kurdî derkevin.”

‘Maliyet bi kêmanî çar pênc qat zêde bûne’

Xwediye weşanxaneya Avestayê Abdullah Keskin, li ser pîrsa me dibêje li gorî berê malîyet bi kêmanî çar-pênc qat zêde bûye; şert û merc nebaş bûne lê niha tu şertên weşangeriyê nemane, îşê me zehmet bû, niha zehmettir bû: “Vêga ge-

lek kitêbên me yên kevn tevî ku me fîyetê wan piçek guhertibin jî pir kêmtir in. Em bixwazin ji nû ve wan kitêban çap bikin em bi pereyê ku niha difiroşin nikarin car din çap bikin. Wisa diyar e ku ji vir û pê ve bi firotinê nabe, bi tu awayî derfet nemaye ku kitêb bêne fînansekirin. Weşanxaneyên hûr û gir eger rêyeke din nebînin, hemû wê bêne girtin. Heta demekê em ê nekevin nav projeyên nû. Bi firotinê tiştê nabe, ne mimkin e xwe xilas bike.”

‘Weşangeriya kurdî li ser milê şexsan û çend dilsozan maye’

Keskin dibêje, rewşa weşangeriya kurdî ji 2015an û vir ve ber bi jêr ve diçû, niha kete bin erdê de û wiha dewam dike. Dewlet dikare gelek tiştan bike lê nakê, bike jî em weşanxaneyên kurd nakvin navê de, tu xêra wê li me nabe: “Em dibêjin bila zirara wan li me nebe bes e, em ne li benda fêdeyekê ne. Bo weşanxaneyan bi qismî be jî alîkarî tê kirin, lê em [weşanxaneyên Kurd] li derveyî wê çarçoveyê ne. Wezareta Çandê [ya Tirkiyê] salane bi milyonan kitêban dikire, bûrsan dide, hin nivîskar û kitêban teşwîq dike, rêya wan xweş dike. Kurdî ji van tiştan mehrûm e, kes li ber barê kurdî ranabe. Weşangeriya kurdî li ser milê şexsan û çend dilsozan maye. Çi dezgeh bin, çi şexs bin, mecbûr e mueseseyaya sponsoriyê zêde bibe lê ew jî li ba me nîne. Bi xwendin û firotina Kurdî bi awayekî normal ne mimkin e ku tu kitêbekê çap bikî.”



'Hin agahiyên xweş derbarê weşangeriya kurdî de'

Di nava ewqas şert û mercên giran de, di qada weşangeriyê de hin agahiyên xweş jî diqewimin.

Cîlda çaremîn a Ferhenga Kurdî-Kurdî ya Seyda M. Emîn Bozarslan çap bû. Çapa berfirehkirî ya ferhenga kurdî tirkî (Amadekar: Zana Farqînî) ji nav weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê;

Ferhengê zazakî - dimilî - kirmancî (Amadekar: Şaban Şenates) ji weşanên Nûbiharê derket.


Ferhenga Mezin ya D. Îzolî jî di nav Weşanên Waqfa Riya Azadiyê da ji nû ve hat çapkirin û belavkirin.

Herwiha Mîrnameya Hekarîyan ji Peywendê derket. Hejmarên nû yên Nûbihar, Bar Helbest û Kurdeçîrokê hatin çapkirin û belavkirin.

Rêjeya pirtûkên kurdî û tirkî

Hêjayî gotinê ye ku, li gorî raporta *Yekîtiya Weşangerên Tirkîyê* ya sala 2021ê li Tirkîyê 438.679.864 pirtûk çap bûne. Wezareta Perwerdeyê ya Tirkîyê (MEB) ji bo xwendekarên dibistanên seretayî û amadeyî 199 milyon û 312 hezar û 299 pirtûk çap kirine. Dema mirov vê jî lê zêde bike hejmara pirtûkên ku li Tirkîyê hatine çapkirin digihîje 637 milyon û 992 hezar û 863yan!

Li gorî nûçeya *Diyarnameyê* sala borî (2021) li bakur û Tirkîyê bi tevahî 377 pirtûkên cuda yên bi kurdî hatine çapkirin. Di nûçeyê de tîraja wan nehatiye diyarkirin lê eger kêm-zêde her yekê em hezar bihesibînin, ew jî dike 370-380 hezar pirtûk.



DAVID FINCHER

YEK JI SÎNEMAGERÊ
HERÎ RESEN Û GIRÎNG
YÊ SALÊN 90Î
Û SEDSALA NÛ

RÛMET MED

Sînemagerê navdar
ê Amerîkî David Fincher
yek ji derhênerên herî
resen û girîngtir yê salên
90î û sedsala nû ye ku
li seranserê erdnîgariya
cîhanê bi filmên xwe
yên wekî; "Alien: 3",
"Se7en", "Fight Club",
"Zodiac", "Panic Room"
û "The Curious Case of
Benjamin Button" ve tê
naskirin û di heman demê
de xelatên; Girovera
Zêrîn (Golden Globe),
Derhênerê Baştirîn
û Xelata Akademiyê
(Oscar) girtine.




David Fincher, di sala 1962yan da li bajarê Denverê yê girêdayî Parêzgeha Koloradoya Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê hate dinê û li Californiyê mezin bû. Tê gotin ku hêj di zarokatiya xwe de filmê "Butch Cassidy And The Sundance Kid" (1969) temaşe dike û bi bandora vî filmî biryar dide ku bibe derhêner. Fincher, di ciwantiya xwe da bi kameraya xwe ya 8mîlîmetreyê dest bi kişandina fîlman dike û di pargîdaniyeke anîmasyonê de dixebite. Di sala 1980yî da derbasî pargîdaniya fîlman a Industrial Light & Magic (ILM) dibe, bi saya vê pargîdaniyê di mijara efektan de dibe pispor. David Fincher, di pêvajoya kişandina filmên wekî "Star Wars Episode IV" (1977) û "Indiana Jones and the Temple of Doom"ê (1984) de jî cih digre. Di 1984an da ji karê xwe yê ILMyê derdikeve û ji bo Komeleya Pençeşerê ya Emerîkayê filmê reklamê dikişîne. Piştî salekê derhêneriya belgefilma "The Beat of The Live Drum"ê dike ku tê de lîstikvan û muzîkvanê navdar Rick Springfield jî cî digre. Fincher Ji bo pargîdaniyên reklamê yên wekî; Revlon, Converse, Nike, Pepsi, Sony, Levi'sê gelek filmên reklamê kişandine û piştî sektora reklaman jî berê xwe daye kişandina klîbên muzîkan. Fincher ji bo hunermend û komên muzîkan ên wek Madonna, Billy Idol, Paula Abdul, Arerosmith, The Rolling Stones, Nine Inch Nails, A Perfect Circle, Jody Watley, Rammstein, Rick Springfiel, Steve Winwood, Neneh Cherry, George Michael, Michael Jackson, The Wallflowers, Wire Train û The Outfielê klîbên vîdyoyan kişandine.

Yek ji derhênerên fîlman ên herî resen û girîng ên salên 90î û sedsala nû David Fincher, di sala 1992yan da bi yekem metrajdirêjê xwe yê bi navê "Alien: 3" re derket pêşberî temaşevanên sînemayê. Filmê pevxistina zanistî bi efektên xwe yên taybet ve ji bo Xelatên Akademiyê bû berendam lê belê fîlm ji aliyê aborî û rexneyî bi serneket. Derhêner Fincher di belgefilmeke ku bo rêzeya fîlmên Alienê hatiye amadekirin de ragihand ku derbarê budçeyê de bi pargîdaniya 20th Century Fox re hin pirsgrîkên wî hebûn. Di sala 1995an da filmê wî yê duyem ê bi navê "Se7en" (Heft) li salonên

sînemayan kete vîzyonê û bandoreke mezin li dîroka hunera sînemayê kir. Senaryoya fîlmê Fincher û Andrew Kevin Walker bi hev re nivîsandin û li ser çîroka du dîdektîfan (Brad Pitt û Morgan Freeman) disekine ku dikevin pey kujerekî. Fîlmê "Se7en" li seranserê cîhanê 300 milyon dolar ji gîşeyan bi dest xist. Piştî du salan bi filmê "The Game" derket pêşberî sînemahizan.

Di sala 1999an da fîlmê David Fincher yê bi navê "Fight Club" (Serlîstikvan: Edward Norton, Helena Bonham Carter û Brad Pitt) kete vîzyonê, fîlm ji romana nivîskarê navdar Chuck Palahniukî ji bo perdeya spî hate kişandin û mohra xwe li salên 90î û li dîroka sînemayê xist. Fight Club, ji aliyê sînemahêz û derdorên sînemayê ve yek ji fîlmên herî serketî tê qebûlkirin û di lîsteya "100 Fîlmên Pîrxweş ên Hemû Deman" ku ji aliyê Total Filmê ve hatiye amadekirin de bû çaremîn. Di destpêka sedsala nû de filmê "Panic Room" (2002) yê derhêner Fincher dikeve vîzyonê, piştî pênc salan jî filmê wî yê "Zodiac" tê. Fîlmê



“Zodiac” (2007) ji pirtûka nivîskar Robert Graysmithî ji bo sînemayê hate kişandin û di filmê balkêş de lîstikvanên wekî; Jake Gyllenhaal, Mark Ruffalo, Robert Downey Jr., Anthony Edwards û Brian Cox lîstin.

Derhêner di sala 2009an da bi filmê xwe yê “The Curious Case of Benjamin Button” ji nû ve derket pêşberî sînamahezan. Senaryoya filmê ji aliyê David Fincher û Eric Rothê ve hate nivîsandin ku ji romana wêjekar F. Scott Fitzgeraldî îlhama xwe girtiye. Fîlm, di heman demê de filmê herî dirêj ê Fincher e. Fîlm li Xelatên Akademiyê (Oscar) di 13 beşan de bû berendam û sê xelat (Derhênerê Hunerê yê Baştirîn, Kostûma Herî Serketî, Makyaja Herî Serketî) girt. Sînemagerê biserketî, bi vî filmî xwe cara yekem ji bo Xelata Derhênerê Baştirîn ê Xelatên Akademiyê xist berendam û di gîşeyê ji zêdetirî 300 milyon dolar pere bi dest xist. “The Curious Case of Benjamin Button” ji niha ve ji bo dîroka hunera sînemayê weke fîlmekî klasîk tê qebûl kirin.



Derhênerê hoste David Fincher di sala 2010î da bi filmê xwe yê “The Social Network” çîroka jiyana avakarê malpera sosyal a Facebookê Mark Zuckerbergê tîne ber perdeya sînemayê û bi vî filmî li Xelatên Akademiyê di 3 beşan de, li Xelatên Girovera Zêrîn di 4 beşan de xelat digre. Fincher di 2011an da dîsa bi lêanîneke wêjeyê derket pêşberî temaşevanên sînemayê. Filmê wî yê nû “The Girl With The Dragon Tattoo” ji romana navdar a nivîskar Stieg Larssonî ji bo hunera heftemîn hate kişandin. Fincher, herî dawî li sînemayê derhêneriya filmên “Gone Girl” (2014) û “Mank”ê (2020) kirin. Fîlmê “Gone Girl” li bernameya Xelatên Girovera Zêrîn, beşên Lîstikvana Baştirîn (Drama) û Derhênerê Baştirîn jî tê de di 4 beşan de bû berendam. David Fincher ji bilî filmên sînemayê, di hin projeyên rêzefîlm û rêzebelgefîlmên televîzyonê de jî weke derhêner û çêker xebitî. Derhêner li ser projeya xwe ya dawî ya bi navê “The Killer”ê dixebite û dîroka vîzyonê ya filmê nû hêj nehatiye eşkerekirin. Fîlmên David Fincher heta niha di çarçoveya gelek festîvalên fîlman ên navneteweyî de hatin nîşandan û di gelek beşan de xelat girtin.

Çavkanî:

- https://en.wikipedia.org/wiki/David_Fincher
- <https://www.imdb.com/name/nm0000399/>
- <https://filmloverss.com/david-fincher-the-killer-adli-yeni-filminin-cekimlerine-kasim-ayinda-baslacak>



DÎROKA PEYKERAN

HOGIR AR




Peyker yek ji hunerên herî kevnar yê li cîhanê ne, lê nayê zanîn ka ev huner ji kîjan demê ve dest pê kiriye. Em di vedîtîna arkeolojîk de, di dema şikeftan de rastî şopên hunera peykeran tîn.

Yek ji yekem nimûneyên hunera peykeran, Venus of Willendorf ji ber ku li gundekî Avûstûryayê tê dîtin navê wî gundî digire ser xwe. Ev ji peykerên herî kevnare ye ku maye heta îro. Arkeologê Avûstûrî Josef Szombathly piştî lêkolîneke di sala 1908a de li gundê Willendorf ya Avûstûryayê diyar kir ku ev peyker hatiye dîtin di navbera 10 – 25 hezar sal berê de hatiye çêkirin, peyker bi mezinahiya xwe 11 cm ye. Peyker îro li Muzeya Dîroka Xwezayî ya Vîyanayê tê peşandan. Ew peyker ji kevirê golikî(kirêç) hatiye çêkirin û ev kevir li erdnîgariya ku peyker lê hatiye dîtin, nayê peydekirin.

Lêkolînên dîrokî Dîbêjin: Sedema sereke ku peyker aniye cîhanê, faktora baweriyê ye. Peykerên ewil ên di dîrokê de tiştên mîna pûtên ji bo îbadetê hatine çêkirin in. Ji ber ku herî yekem ji dar hatine çêkirin di xwezayê de rizîya ne û tîk çûne.

Em dikarin bi sê çandên mezin ên peykersaziyê ku hunera peykeran çêdikin û forma wê ya îroyîn didomînin wisa binav bikin; Peykerên Misrê, Peykerên Grek(Yûnan) û Peykerên Romayê.

Hunera Peykeran Li Misrê



Dîroka peykerên Misrê yek ji dîroka herî kûr a peykerê ye. Peykerê Sphinx, yek ji mezintirîn peykerên cîhanê ye, bi hezaran sal berê li Misrê hate çêkirin

Hunera Peykerên Grek(Yûnan)

Hunera peykerê Grek li ser sê beşan tê dabeş kirin: Serdema kevnar, serdema klasîk û serdema Helenîstîk.

-Di Serdema Kevnar de faktora baweriyê bîngeha tiştên estetîkî yê



sê-alî ango 3d ne ku di demên kevnar de bi bikaranîna kevir û hestî hatine çêkirin. Ev peyker bi piranî xweda û xwedawendên Grek in.

-Di Serdema klasîk de tê dîtin ku peykerên xweda û xwedawenda zêde bûne. Peykerê herî navdar ê vê serdemê peykerê Athena ye ku ji diranê filan hatiye çêkirin.

-Di Serdema Helenîstîk de, gelek huner bi xêzên tûj dest bi teşekirinê dikin û hunera herî navdar ya vê serdemê peykersazi ye. Di Serdema Helenîstîk de, gelek peyker di vê heyamê de serwer û lehengên şer temsîl dikin û bi tarzeke realîstîk hatine çêkirin. Di nav xebatên navdar ên vê serdemê de navên wekî Venus de Milo, Menelaos û Patroklos hene...

Li Romayê Hunera Peykerê

Romayîyan di hunera peykerê de peykerê Grek teqlîd kirin. Her çend di warê hunerî de têgîhiştinek wan a orjînal tunebû jî, di vî warî de wan gelek cûrbecûr berhem dan. Obodisk Theodosius li Stenbolê yek ji van karan e û ji serdema Bîzansê ye.

Di şaristaniyên Kurdistanê de peyker

Îro, rojhilatê Sûriye, başûrê rojhilatê Anatolyayê(Tirkiye) û Bakûrê Iraqê navendek e ev der wek navenda gelên Îranî tê hesibandin. Kurdistan di Grekî-



ya Kevnar de tê wateya “cîhê navbera du çeman” μέσος (“di navbera”) û πτόταμος (“çem”). Du çemên ku mebest jê tê kirin çemên Firat û Dîcleyê ne, ji ber ku herêma di navbera van her du çeman de ye jê re Kurdistan hatîye gotin.

Ji ber avhewayaya Kurditanê ku di bin asîmanek geş û bê ewr de ye, asîman li vî welatî bûye çavkaniya her cûreyê ramanan. Her çend ji gelek aliyên ve welatek paşvemaî be jî, di zanîna esmanî, bîrkarî û olê de ew gihîştîye asteke bilind.

Ev sedem e ku mîmariya Kurdistanê li ser bingeha mîmariya perestgehan ava bûye. Aluviyûmên ku ji hêla çemên Dîcleyê û Feratê ve dihatin hilberandin mîna pelên axê bûn û ji bo afirandina berhemên hunerî ne guncav bûn. Wekî hunera Misrê di hunera Kurdistanê de qutbûnek çêbû. Li gorî arkeologan, ev bi xwe çêbû, di encama lehiyek mezîna li herêma de derket holê. Şarîstaniya kevn ji ber lehiyek


wêran bû û di encama koçberiyên de Huner û şarîstaniyên nû derketin holê.


Sumerî, Akadî, Babîlî, Elamî, Ur-Urukî, Lagaşî û Nînewanî yên ku di salên 30-40î berî zayînê de dijîyan li vir bajarên mezîna ava kirin. Ji ber ku wan kerpîçek wekî materyal bikar anîne, dema ku ew di navbera vî bajarê mezîna de bûye kelemek heriyê, peyker û rolyefên ji kevir hene.

Ji ber ku li Kurdistanê kevir hindik e, tiştên ku di goran de hatin dîtin bi piranî ji Zêr û Zîv hatine çêkirin. Bi xebatên ku wan li ser metal wekî rolêfe çêkirine, reqemên nezik û zûtir ên di nêzîk wêneyên Misrê de, nezik û bilez formên geometrîk li dar xistin e.

Mirovên ku li Kurdistanê yekem karên hunerî fêhm kirin Sumeriyên ku ji Asyaya Navîn hatin û li Kurdistanê bi cî bûn. Ji ber ku kevir kêma bû, Sumeriyên neçar ma ku avahiyên xwe ji kerpîçê axê yê ku teşeyên rêkûpêk digirin bi hişkkirina wan li ber tavê di qaliban de çêbikin. Pirîketên hişk ên ku di tendûrê de hatin şewitandin zêde nehatin bikar anîn. Bajarên Sumeriyên bi dîwaran hatibûn dorpeç kirin û ji bo xwedayan perestgeh, qesr û xaniyên padîşahan hatibûn çêkirin.

Forma perestgehê ya herî girîng perestgehên bircê ne, ku ji kerpîçê ên li ser hev hatine danîn, ku ji wan re ZIGGUART tê gotin. Van





terasan bi nêrdewanan an rampan ve girêdayî ye. Perestgeh û qesra qraliyetê ya ku pêşya mîladê 3 hezaran ne, ku li dijî herikîna çem hatî avakirin, ji gelek ode û korîdorên ku li hewşên bilind ên hewşên çargoşeyî dorpêçandî ne, pêk tê.

Sumerî, Akadî, Farisî, Babîlanî, Aramî û Suryanî, wek Babîlî ji xeynî vana, gelek gel û qebîleyên din li Kurdistanê şîn bûn. Hebûna Hîfît, Med û Farisan li Mezopotamyaya Jor zêdetir e. Şaristaniya Ûrartû di kevnariyê de li bakurê rojhilatê Kurdistana Jorîn pêş ket.

Peykerên Sumerîyan

Samarra, Halaf û Hasuna dikarin ji mînaka wargehên navdar ên serdema ji destpêka geşedana çandinî û jiyana gund bigire heya derketina nivîsandinê bêne dayîn. Ew dikare wekî serdema Uruk were binav kirin (pêşya mîlade 4000 pêşya mîladê 3100). Di vê serdemê de, bajarên li başûr gelek pêşve çûn. Ur-Nanşe ku li Lagaş

bû desthilatdar, bi avahiyên ku çêkir ve hat rojevê. Urukagina jî bi saya reformên xweyên yekem ên nivîskî hat nas kirin. Vê paşê, perestgeha Enlil, xwedayê sereke yê Sumerîyan, li Nippur bû, ji ber vê yekê Nippur wekî paytexta olî ya Sumerîyan hate hesabandin. Pêşya mîladê Dema ku Sumerîyan di salên 2400-2350î de kêmbûn, Akad zêde bûn.

Bi peykeran re celebê hevbeş, rûyên qelew, çavên mezin, berçavên stûr û devk



bi zexm girtî ye. Serê jinekê li ber çavan mînakê xwerû ye. Piraniya peykerên ku îro derketine holê ji metalên wekî Zêr û Zîv hatine çêkirin. Wekî din, tê dîtîn ku hunermendên, karê xwe kirine zerikê dara-mîrkuî li asfaltê bi qîr nexş kirine bi piranî, lê bejnên peykeran tazî ne. Cilên celeb-pêlav ji pêçek hûrik û stûr hatine çêkirin. Helwesta laşan pêş e. Ser rast in, destên xwe ber singê ve girêdidin û çav bi taybetî mezin in. Ji ber ku ew li ser her beşê bi rengekî cuda disekin, nerazîbûn hem di peykerê de û hem jî li ser rol-yefan tê dîtîn. Ser û hêmanên wê (çav, poz, por, rih û hwd.) girîngtir hatin hesibandin, û ling jî kêr hatin nirxandin. Bi şewazek zindî ne, lê di rewşek qeşagirtî de ne û nêzîkê formek geometrîk in.

Peykerên Sumer – Lagash

Piştî navberek diyar, Sumeryan di dema Qral Gudea de pêşiya mîladê (206 Berî Zayînê)

dîsa desthilatdar bûn. Di vê serdemê de di tevgerên hunerê de vejînek heye. Karûbarên gelemperî li paytexta Lagaş zûtir bûn û gelek serageh û perestgeh hatin avakirin. Berhemên herî girîng ên hatine vedîtin peyker in. Vana bi baldarî ji kevîrên pir hişk hatine çêkirin. Di derbarê Peykera Sumer de agahdariya çêtir didin. Dema ku mohrên li ser Berheman di axê de nerm têne xebitandin bêdawî dikare were stendin di nexş û Nimûşên berheman de.

Peykerên Babil û Asûr

Dîwarên şer, nêçîr, ol an jîyana qesrê li ser dîwarên ku wan bi kevîrên kevîr ên kevîran an alabastera stûr çêdikirin hildikişandin. Di piraniya van wêneyên arîkariyê de, padîşah rih û porê porrûyî heye. Mirovên din ên dora wî dişibin hev. Dîmenên nêçîrê pir bi zelaî têne xêz kirin. Peykerên şer an tîrên serê mirovan deriyên perestgeh û serayên Aşûriyan diparastin. Hunera Suryanî derbirîna leşkerî wekî bingeh qebûl kiriye. Motîfên lehengên tîpa leheng girîng bûne. Padîşah di celebê nêr de hêzdar û hêzdar têne nîşandan. Bedena werzişvanek masûlkeyên wan yê werimandî hene. Dîsa, çavên mezin, çavên stûr, pozek xurt û rihek dirêj mijarên derbirîne ne. Çekên ku ew hildigirin ji tîr û tîrê şûr dirêj pêk tîne. Peykersazên Suryanî ji bo Xweda û padîşahan li ser mezinahiya xwezayî peykerên bîrdariyê çêkirin. Girîngî li ser anatomiya laş û rêjeya di navbera deverên cihêreng ên laş de hatiye danîn. Hêz û enerjîyek berhevkişî hem di xebatên plastîk ên belaş de û hem jî di alîkariyan de tê fêhm kirin. Di hunera plastîk a Suryanî de, padîşah bi dua an bi cejnên şer, êrîş, dorpêç, nêçîra heywanên kovî, serfirazî tê nîşandan. Stylewaza embarên kevîrî yê ku dîwarên qesrê dixemilînin realist in. Dîmenên şer an nêçîrê bi tevahî di zemînek rastîn de têne xuya kirin. Di navenda besteyan de padîşah di mezinahiyek ji yê din mezintir e. Çiqas mirov û heywan ji padîşah bêne derxistin, ew hindiktir in. Ev nîşan dide ku ew bi pirsgirêka perspektîfê re mijûl dibin. Shaves peykerên Suryanîyan di pêşandanên ajalan de herî serketî ne.



CIZDANÊN HERÎ BAŞ ÊN JI BO VEŞARTINA PEREYÊN KRÎPTO

GRAFIKURD



Pereyên krîpto di salên dawî de hema hema ketiye rojeva her kesî. Îro bi milyonan kes xwediyên coinan in. Ev yek ji bo pêşveçûna bazarê gelek baş e lêbelê gelek rîskan jî bi xwe re tîne. Di demên dawî de tevî coinan gelek borse jî derabeyên xwe digirin. Platformên sextekar dawî li xizmetên xwe tînin û veberhêneran mexdûr dikin.

Gava yek pereyekî krîpto bistîne divê ewil vê yekê bifikire; Gelo ez ê çawa bikaribim bi-parêzim?

Ji bo parastina pereyên krîpto riya herî baş cizdan ango walletên dijîtal û fizîkî ne.

Di bazarê de gelek cizdanên fizîkî hene. Ev cizdan bi qasî flashdîskê ne û bi şifreyan tînan parastin.



Wek pêşniyazê ez dikarim navên wan cizdanan binivîsim;

1. Ledger Nano X
2. Trezor Model T
3. CoolWallet Pro
4. KeepKey
5. Ellipal Titan
6. Safepal S1
7. SecuX V20
8. Keystone Pro

Ji vana re cizdanên sar jî tînan gotin. Maneya 'sar' ev e ku internet bi vana re nayê girêdan û heta ku we nexist kompîturê bi torê re girêdan pêk nayê. Ev tişt jî wan ewletir dike. Ev cizdanên li jor bi temamî fizîkî ne û jî internetê tînan sîparîşkirin. Piştî we sîparîş kir û hat, li gorî rêbera di qutiyê de hûn dikarin saz bikin. Lêbelê di dema sazkirinê de divê hûn "peyvên nepen" ji bo ku jibîr nekin li ser kaxizekê binivîsin da ku rojekê we şifre ji bîr kir an jî cîhaz wenda kir hûn karibin pereyên xwe yê krîpto xilas bikin.

Cizdanên fizîkî di salên dawî de eleqeyê zêde dibînin. Kesên profesyonel bi taybetî van cizdanan bi kar tînin. Lêbelê ev ne şert



e. Heke hûn naxwazin vana bistînin hûn dikarin wek sepan jî li ser telefona xwe yan jî kompîturê pereyên xwe biparêzin.

Li jêr ez ê behsa 5 sepanên herî baş ên walletê bikim. Ez bi xwe jî van sepanan bi kar tînim û pêşniyaz dikim. Li gorî bi hezaran pirs û bersivan gelek kesên profesyonel jî van sepanên jêr pêşniyaz dikin. Sazkirin û bikaranîna van sepanan hêsan û wekî yên fîzîkî ji bo wan jî divê hûn di kaxizekê de “peyvên nepen” biparêzin.

Herwiha ez dikarim vê tiştê bi bîra we bixim. Îro gelek cizdanên pir-coin bi “peyvên nepen” dixebitin. Lê heke yek coin tenê hebe wek mînak Bitcoin an jî Ethereum hûn dikarin “mifteya nepen” (private key) jî kopî bikin û li cihekî bêinternet biparêzin.

CIZDANÊN PÊŞNIYAZKIRÎ EV IN;



coinomi

Coinomî di telefon û kompîturê de dixebite. Bikaranîna vê pir hêsan e. Di bazara krîptoyê de em dikarin bibêjin yek ji sepanên ewil e. Di Coinomiyê de hûn dikarin 1800 coin û tokenan biparêzin. Ji bo ku him kevn û pêbawer e, him jî piştgiyariya gelek toran dike îro jî aliyê bi milyonan kesî ve tê bikaranîn. Wekî din, di Coinomiyê de NFT'yên ERC-721ê jî tên parastin. Coinomî zêdetirî 8 sal in xizmetê dide. Heta niha êrîşeke berbiçav a sîber lê nehatiye kirin. Lêbelê dîsa jî divê hûn baldar bin û dema we krîptoyên xwe lê bar kir hay ji daneyên telefonê hebin û “peyvên nepen” li cihekî ewle biparêzin.



EXODUS

Exodus Wallet di bazarê de nû ye. Lêbelê ji roja ku derketiye heta niha eleqeya ji bo wê her ku çû zêde bûye. Ev cizdan gelek sade û hêsan e. Wekî cizdanên din ne tevlihev e û bikaranîna wê gelek rihet e. Ji bo kesên ku naxwazin serê xwe zêde biêşnin Exodus cizdanê baş e. Di vê cizdanê de zêdetirî 130 coin tên parastin.



coinbase

Cizdana Coinbase Walletê jî gelek tê tercîhkirin. Bi temamî jî aliyê bikarhêneran ve tê kontrolkirin. Bi saya ku borseyan mezin li paş in hûn dikarin bi dilekî rihet bi kar bînin. Di Coinbase Walletê de piştgiyariya NFTyê jî tê dayîn. Ev yek jî danûstandina NFTyê hêsanter dike. Coinbase Walletê li tevahiya dinyayê wek borseya herî pêbawer tê zanîn.



Ev cizdan gelek rihet e û dikare 300 coinan bihewîne. Li ser kompîturê jî bernamêyeke wê ya gelek rêkûpêk heye. Wekî din hûn dikarin bi karta krediyê ji ser vê sepanê coinan jî bistînin.



Ev cizdan di rêza dawî de ye lêbelê ev nayê vê maneyê ku xirab e. Gelek blockchainên “smart contract” di vê cizdanê de tên parastin. Trust Wallet di sepana telefonê de jî derfeta girêdana bi dAppê dide. Hûn dikarin ji (Borseyan Bênavend) DEX'an danûstandina coinan bikin. Hûn dikarin bi dilekî rihet Trust Walletê bi kar bînin. Ez bi xwe jî ji bo parastina coinên Binance Smart Chain û Ethereum ê vê cizdanê bi kar tînim. Trust Wallet tevî BEP2, BEP20, ERC20, TRC20 û ERC271î piştgiyariya tora Solanayê jî dike. Hûn dikarin bi dilekî rihet coin û tokenan tê de veşêrin. Di Trust Walletê de parastina NFTyan jî dibe.







Di dawiyê de divê ez bibêjim; Pereyên krîpto wek xwezayî pir birîsk û talûke ne. Her roj bi sedan nûçeyên sextekariyê tên bihistin. Beriya ku we pere li krîptoyan razand lêkolîna xwe baş bikin.

Koma Kovargerên Kurd

Koma Kovargerên Kurd bi hêvîya kovargerên kurd bîne ba hev, bîngeheka sazgehiyê bide kovargerîya kurdî, kovargerîya kurdî hem bi sêwirandinê hem bi naverokê bi pêş da bibe û pîrsgirêkên kovarên kurdî bi hev ra çareser bike hatîye damezirandin.

Kovarên Endam







 /KovargerênKurd
 KovargerênKurd@gmail.com

The **Hall** Kurdî
Endama Koma Kovargerên Kurd e